MIROVÊN BÊKAR

Omerê Mûsilî
Duhok

Tu rûdinê li çayxaneyê,
tu naçî kar û pirtûkxaneyê.

Mirovo halê te xerab e,
bê kar mirov qet nabe.

Zar û zêçên te birçî ne,
li ber dîwaran bê cî ne.

Rûsar in ew, dilşikestî ne,
cî û warê te, tev girî ne.

Û tim dilîzî bi kaxezan,
dipeyvî tu, weke rêzan.

Bi gotin û şorên kolan,
ava nabe tu car nîştiman.

Rabe biçîne dexil û war,
şînke axa welatî kevnar.

Xelkê me bibin xwedî kar,
xelas bin ji şopên kevnar.

Bila nemînin sêwî, hejar
bila nemînin kesên bêkar

Bila carek ew bibin huşyar,
ew bibin xwedî xebat û kar.

Da geş bibin kulîlk û dar,
da şîn bibe çol û beyar.